

# 6. Lehengiya Şetrencê li Qamişlo hate lidarxistin

Ev cara 6 mîne ku şampiyona şetrencê li Herêma Cizîrê tê li darxistin, taybet şampiyona Qamişlo a şetrencê ya vekirî, her wiha ku ev şampiyona ya di her salê carek di mehe Kanûnê de tê li darxistinî. Di heman demê de her tim jî tenê ji bajarên Herêma Cizîrê tevlîbûn çêdibe, lê di vê salê de cara yekemîn jin tevlî dibin, her wiha jî lîstikvanên şetrencê ji Tebqa û Minbicê yê jî beşdarî vê lehengiyê dibin. Ev lehengî di bi beşdarbûna zêdeyî 50 lîstikvanan li Hola Ş.Zelal a li avahiya Yekîtiya Werzîşê ya Herêma Cizîrê li bajarê Qamişlo di 7'ê Kanûnê hate li darxistin.

**HER SAL TÊ LİDARXİSTİN, LÊ GUHERTİN HEBÛ**

Di şampiyona Qamişlo Şatrencê ya vekirî de ji zarok heye mezin ji herdu zayendan beşdsar bûn. Her wiha ev şampiyonê dê di demjimêra 10'an de li Hola Ş.Zelal bi beşdarbûna 51 lîstikavav bi kopiyaya xweyî 6. destpêkiribû û du rojan dewam kir. Di ne hêza bedenî anjî fîzîkî hêza raman û hişmendî pêwîst dike. Her wih aev lehengiya şetrencê bi saîsîtema Siwîsrayê hate lîstîn, ku di kategoriya zilamn de 23 lîstikvan û 9 jin 3 jê ji Tebqayê bûn.

**NMAEYA YEKÎTİYA DANE DİYER KİRİRN**

Di vê lehengiya şetrencê de ku hersê kategorî ji herêm û netewên cida beşdarî wê bûn, ev nameyek yekebûyîn bê cudahiya temen, cins û netewî ku di riya yek raman û armancê dimieşin dide diyar kirin.Ev name bersiv baş dide kesên ku dixwazin fitinê di nav bakurê sûriyê de çêbikin û ewlehiya wê xirabikin. Encamnameya lehengiy Qamişlo ya Şetrenca vekirî wiha ne:

Kategoriay mêran: Rêza yekemîn: ji Herêma Cizîrê Fîras Issa.

Rêza duyemîn: Herêma Cizîrê Ebdilrehman Mehmûd.

Rêza sêyemîn: Minbicê-Idrîs Osib.

Jin: Rêza yekemîn: Ji Herêma Cizîrê-Sîdar Ristem.



heman demê de hêjayî gotinê ku lîstikvanê Herêma Cizîrê di ser asta Sûriyê de gelek serkeftinên ji rêza yekemîn bi destxistine, lê di vê carê de guhertin heye ji ber lîstikvanên ji Tebqayê û Minbicê jî hatine, her wiha astan wan pir başe. Yanî ev şampiyon anjî pêşbirekek zor û bi heyecan bû. ji ber ku ev lîstika şetrencê

Rêza duyemîn: Tebqa-Sara El-Mihemd.

Rêza sêyemîn: Herêma Cizîrê-Felek Ehmed.

Xelata ji lîstikvana herî biçûk jî Êva Faris.

Ciwan:Rêza yekemîn: Herêma Cizîrê-Zekeriya Xelîl.

Rêza duyemîn:Ronî Cûdî.

Rêza sêyemîn:Herêma Cizîrê-Heyder Ismayîl...*Ronahî/Qamişlo*



# Li Reqayê xebatên sporê bi pêşdikevin

Komîteya Ciwan û Werzîşê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê bi dirûşmeya 'Werzîş beriya ku bibe pêşbirka pêkanîna yekemîntiyê, perwerdekirina giyan e', Kongreya Yekîtiya Werzîşê ya Damezrîner a Yekemîn li darxist.

Kongre li stada Firatê ya werzîşê li dar ket. Nûnerên Meclisa Sivîl a Reqa, endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn, bi dehan werzîşvan, nûnerên Partiya Pêşerojê ya







Sûriyê, endamên Komîteya Ciwan û Werzîşê û şandeyên ji Bakurê Sûriyê berşdarî kongreyê bûn. Axaftina destpêkê ya di kongreyê de ji hêla endamê Meclisa Sûriya Demokratîk Cîhad Umer ve hate kirin. Cîhad wiha got: "Werzîş perwerdekirina hiş û giyan e. Lê dijmin hewl da wê di civaka me de tune bike û bi saya keda ciwanan em ji nû ve vedigerînin herêmê. Tu hêzek nikare me ji hev du cuda bike. Me ev tişt li çeperan isbat kir û em ê wê li stadan jî isbat bikin."



Umer wiha dewam kir: "Dema giyana werzîşê ji rihê hevaltiyê dûr be wê demê bê wate dimîne. Bi rihê hevaltî em dikarin werzîşê pêş bixin. Dema terorê herêm dagir kiribû bi armanca leşkerkirina ciwanan, werzîş qedexe kiribû. Bi rêya kongreyê, em ê ji cîhanê re isbat bikin ku tevî komployan jî bajarê me aram e."

Endamê Meclisa Sivîl a Reqayê Hesen Mistefa axivî û got: "Em vê rojê û avakirina Yekîtiya Werzîşê li hemû werzîşvanan pîroz dikin. Ne girîng e ku tu werzîşvan bî, lê divê tu wê pêk bînî, ev tişt me di dirûşmeya kongreyê de dît."

Endamê Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Abdullah El-Şelebî lidarxistina kongreyê pîroz kir û spasiya keda hemû kesên ku rolek di lidarxistina kongreyê de lîstine kir. Her wiha El-Şelebî destnîşan kir ku bi saya QSD'ê teror ji herêmê hate qewirandin û diyar kir ku lidarketina kongreyê wê rolek girîng di jiyana hemwelatiyan de bilîze û ew ê piştgiriya çalakiyên werzîşê di lîstokgehan û dibistanan de bikin.

Piştî bidawîbûna axaftinan rêziknameya yekîtiyê ji hêla endama Komîteya Ciwan û Werzîşê ve Fatme El-Xelîf ve hate xwendin û beşadaran bendên rêziknameyê nîqaş kirin.

Piştî wê hilbijartina hate kirin, 16 endam ji bo Koordînasyona Giştî ya Yekîtiya Werzîşê hatin hilbijartin. Her wiha koordînasyon wê hevserokatiya yekîtiyê û hevserokên komîteyên girêdayî yekîtiyê(Komîteyên Rêxistinkirin û Têkiliyan, Lîstokên Giştî, Lîstokên Tekekesî, Werzîşa Dibistanê, Werzîşa Jinan, Ragihandin, Malî û avahî) erkdar bike...*ANHA*

şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 504 10-Kanûn- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## YPG'ê lê da, 4 dagirker hatin kuştin



Navenda Ragihandinê ya YPG'ê daxuyaniyek da û diyar kir, di çarçoveya qonaxa duyemîn a Berxwedana Serdemê ya Efrînê de, li navenda Efrînê û bejahiya navçeyên Cindirêsê û Bilbilê, li dijî artêşa Tirk a dagirker û komên wê yên çete 3 çalakiyên sabotajê hatine kirin. YPG'ê diyar kir ku di çalakiyan de 4 çete hatin kuştin.*R-2*

# AN YEKÎTÎ AN TÊKÇÛN

**Gelê Kurd û hêzên siyasî yên Kurd li ser yekîtiya netewî nîqaşên xwe didomînin. Nûnerên partiyên siyasî yên Kurd diyar dikin ku tenê Kurd bi avakirina yekîtiya xwe wê karibe bibe xwedî hêz. Berevajî wê winda bike.**



### DIVÊ KURD JÎ BIBIN YEK

Sekreterê Giştî yê Partiya Komunîst a Kurdistanê Necmeddîn Melle Omer işaret bi girîngî û lezgîniya yekîtiya neteweyî kir û got, "Partiyên Kurdan divê li gorî berjewendiyên Kurdan çarçoveya kongreya neteweyî de li hev bicivin. Rejîmên Tirkiye, Amerîka, Îran, Sûriye li gel nakokiyên cidî jî, dema mijar didbe Kurd dibin yek. Em çima nikarin bibin yek." *R-4*



### DIVÊ PDK Û YNK GAV BAVÊJIN

Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Lîberal a Kurdistanê Ferhad Telo jî diyar kir ku an wê Kurd hemû bi hevre bi ser bikevin an jî wê bi hevre winda bikin. Telo bang li PDK û YNK'ê kir ku ji bo pêkhatina Kongreya Neteweyî ya Kurd gavan biavêjin û got: "Kongreya Neteweyî dermanê pirsgirêkên sedan salan ên Kurd û Kurdistanê ye." *R-4*




### BÊ YEKÎTÎ KURD BI SER NAKEVIN


Hevserokê Kongreya Civaka Demokratîk KCD'ê Berdan Ozturk jî bal kişand ser girîngiya yekitiya gelê kurd û diyar kir ku girtina buroyên Tevgera Azadî li dijî yekîtiya netewî ye û got: "Kurd ji bo pêşeroja xwe divê biryaran bidin û bên gel hev. Ger yekitiya me tune be û em di rewşek parçekirî de bin, wê demê em ê nikaribin bi ser bikevin. *R-4*

## Çareseriya aloziya Sûriyê bi danûstandinê ye



Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD'ê bi munasebeta 3'yemîn ya damezrandina xwe daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hat gotin ku MSD'ê di van sê salan di aliyê siyasî de roleke girîng lîstiye. MSD'ê da zanîn ku ew danûstandinê weke rêbaza sereke ya çareseriya şer û aloziya Sûriyê dibînin û got, "Têkoşîna me ya ji bo pêkanîna Netewa Demokratîk, biratiya gelan û rizgarkirina Efrînê wê dewam bike." *R-5*

## QSD'ê rêxistina terorîst ya herî xeter têk bir



Serfermandarê artêşa Emerîkayê Joseph Dunford diyar kir ku Hêzên Sûriya Demokratîk QSD ji hemû pêkhateyên Sûriyê pêk tê û diyar kir ku QSD'ê rêxistina terorîst ya herî xeter a li Rojhilata Navîn DAIŞ têk bir. Dunford da zanîn ku hê rêya wan li Sûriyê dirêj e. *R-5*

## 125 kes ketin greva birçîbûnê



Çalakiyên li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan û piştgiriya ji bo çalakiya Parlementera HDP'ê Leyla Guven berdewam dikin. Kongreya Star û PYD'ê li navçeya Girkê Legê li dijî tecrîdê konê çalakiya greva birçîbûnê veda. 125 kesan dest bi çalakiyê kir. Wê çalakî du rojan dewam bike. Endama Rêveberiya Kongreya Star Şaha Xelîl axivî û diyar kir ku wê çalakiyên berdewam bikin. *R-2*

## Divê Rêber Ocalan êdî azad bibe




Sekreterê Giştî yê Partiya Çep Demokratîk a Kurdistanê Salih Gedo bal kişand ser tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û got, "Ne tenê gelê Kurd, Hemû gelên cîhanê daxwaza azadiya Rêber Ocalan dikin. Ji bo azadiya Rêber Ocalan divê her kes bikeve nava tevgerê. *R-4*

## Nexweşxaneya Avrîn bê navber dixebite




Piştî ku welatiyên Efrînê ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk li Şehbayê bi cih bûn, Meclisa Tenduristiyê ya Efrînê bi armanca pêşkêşkirina xebatên tenduristiyê nexweşxaneyeke biçûk bi navê Avrîn vekir. Doktorê Nexweşxaneya Avrîn Dr. Azad Sebrî diyar kir ku rojane zêdeyî 600 nexweş diçin nexweşxaneyê û ew ji ber kêmbûna dermanan zehmetiyan dikişînin. *R-6*

## Rêziknameya desteyan tê amadekirin




Xebatên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê navber dewam dikin. Hevseroka Desteya Rêveber a Rêveberiya Xweser Bêrîvan Xalid diyar kir wê di nava 10 rojan de rêziknameya deste û komîteyên girêdayî rêveberiyê amade bibe. Bêrîvan Xalid da zanîn ku heta niha 3 desteyan rêziknameyên xwe amade kirine. *R-3*

## Divê CPT ji bo Ocalan bikeve dewrê



Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan roj bi roj tê girankirin û berdewam dike. Fikarên di derbarê Rêber Ocalan de her diçe zêde dibin. Parêzerê Ocalan Îbrahîm Bîlmez nerazîbûn nîşanî tecrîdkirina Ocalan da û di serî de CPT bang li saziyên Ewropayê kir tavilê bikevin nava tevgerê. *R-5*

## Li Efrînê dagirkeran welatiyek kuştin



Kiryarên hovane yên leşker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk li Efrînê li dijî welatiyan bê navber didomin. Roj tune ye ku dagirker welatiyên Efrînê nakujin. Hat ragihandin ku dagirkeran welatiyê bi navê Mihemed Reşîd Ehmed yê ji gundê Qurne yê Bilbilê gulebaran kirine û kuştine. *R-2*

## Bi helbestan çîroka Efrînê vedibêje

Xelîl Hesen yê 14 salî ji Gundê Remedana yê Şiyê ye. Piştî ku Efrîn ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wî de hat dagirkirin ew û malbata xwe jî mîna bi deh hezaran malbatên Efrînê neçar man ji gundê xwe derketin û li Şehbayê bi cih bûn. Xelîl Hesen niha bi helbestên xwe yên ku dinivîse behsa lehengiya Efrînê û bedewiya xwezaya wê dike. *R-7*

# YPG’ê lê da, 4 dagirker hatin kuştin

**Navenda Ragihandinê ya YPG’ê daxuyaniyek da û diyar kir, di çarçoveya qonaxa duyemîn a Berxwedana Serdemê ya Efrînê de, li navenda Efrînê û bejahiya navçeyên Cindirêsê û Bilbilê, li dijî artêşa Tirk a dagirker û komên wê yên çete 3 çalakiyên sabotajê hatine kirin. YPG’ê diyar kir ku di çalakiyan de 4 çete hatin kuştin.**

Şervanên YPG/YPJ’ê li Efrînê li dijî artêşa Tirk a dagirker û komên wê yên çete 3 çalakiyên sabotajê pêk anîn. Di çalakiyan de 4 çete hatin kuştin.
Navenda Ragihandinê ya YPG’ê diyar kir, di çarçoveya qonaxa duyemîn a Berxwedana Serdemê ya Efrînê de, li navenda Efrînê û bejahiya navçeyên Cindirêsê û Bilbilê, li dijî artêşa Tirk a dagirker û komên wê yên çete 3 çalakiyên sabotajê hatine kirin.
Li gorî daxuyaniyê, tîmeke YPG’ê roja 7’ê Kanûnê li bejahiya gundê Dêbelûtê yê navçeya Cindirêsê ya Efrînê, li dijî wesayiteke leşkerî ya çeteyên Ehrar el-Şam çalakiyeke



sabotajê pêk anî. Di encamê de 2 çeteyên dagirker hatin kuştin.
Navendê diyar kir, 8’ê Kanûnê li rojavayê navenda bajarê Efrînê li dijî wesayiteke koma çete ya bi navê Ehrar el-Şerqiyek tîmeke YPG’ê çalakiyeke sabotajê kir. Hate gotin, di çalakiyê de kuştî û birîndarên çeteyan çêbûn, lê li ser hejmarê agahiyeke zelal bi dest neket.
Di dawiya daxuyaniyê de hate gotin, “8’ê Kanûnê tîmeke me li ser rêya gundê Şêxurzê yê navçeya Bilbilê, li dijî wesayiteke leşkerî ya koma çete ya Sûltan Mûrad çalakiya sabotajê pêk anî. Di çalakiyê de 2 dagirker hatin kuştin.”

## Li Hewlêrê koma 10’emîn greva birçîbûnê dewir girt

Greva birçîbûnê ya Nûnertiya HDP’ê ya li Hewlêrê di roja 19’emîn de bi koma 10’emîn berdewam dike.
Li Nûnertiya HDP’ê ya li Hewlêrê greva birçîbûnê ya ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya çalakiya Hevseroka KCD’ê û parlementera Colemêrgê Leyla Guven di roja 19’emîn de didome û koma 10’emîn grev dewir girt.
Hevseroka Nûnertiya HDP’ê Muzeyen Guneş di dema merasîma dewirwergirtinê de eşkere kir ku heta ku tecrîd berdewam bike, wê çalakiyan wan jî bidome û got; “Heta niha bi dehan partiyên siyasî,



rêxistinên navxweyî û biyanî, sefîrên welatan û kesayetan serdana çalakiya greva me ya birçîbûnê kirine û piştgiriya xwe anîne ziman.
Herwiha em daxwaz ji hemû beşên civakê dikin ku piştgiriya xwe berdewam bikin.”

## 125 kes ketin greva birçîbûnê



Li navçeya Girkê Legê 125 kes li dijî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya ji bo Parlementera HDP’ê Leyla Guven, ketin greva birçîbûnê.
Kongreya Star û PYD`ê li dijî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya çalakiya parlamentera HDP’ê Leyla Guven ya ku li li zîndana Amedê de girtî ye, li navenda HPC`ê ya li navçeya Girkê Legê konê çalakiya greva birçîbûnê veda.125 kesên ji Girkê Legê û gundên wê tev lî çalakiyê bûn. Kon bi wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, alên YPG û YPJ`ê, Kongreya Star û PYD`ê hate xemilandin. Wê çalakiya birçîbûnê 2 rojan dewam bike.
Di çalakiyê de Endama Rêveberiya Kongreya Star Şaha Xelîl axivî û diyar kir ku armanca wan a çalakiyê, şermezarkirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya Leyla Guven e. Şaha ji rêxistinên mafên mirovan xwest ku li dijî tecrîdê bikevin nava tevgerê…
*ANHA*

## Li Efrînê dagirkeran welatiyek kuştin

**Kiryarên hovane yên leşker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk li Efrînê li dijî welatiyan bê navber didomin. Roj tune ye ku dagirker welatiyên Efrînê nakujin. Hat ragihandin ku dagirkeran welatiyê bi navê Mihemed Reşîd Ehmed yê ji gundê Qurne yê Bilbilê gulebaran kirine û kuştine.**





Li kantona Efrînê artêşa Tirk a dagirker û çetyên wê welatiyê bi navê Mihemed Reşîd Ehmed, kuştin.
Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê hovîtiya xwe li Efrînê berdewam dikin. Dagirkeran welatiyê bi navê Mihemed Reşîd Ehmed ê ji gundê Qurnê yê navçeya Bilbilê ya girêdayî kantona Efrînê, kuştin. Li gorî çavkaniyeke herêmî ragihand sedema kuştina wî nehatiye diyarkirin.
Her wiha çavkaniyan diyar kir ku artêşa Tirk a dagirker welatî gulebaran kirin û ji ber wê jî jiyana xwe ji dest da.

## Rêveberiya Xweser buhayê gumrikê kir yek

Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê buhayê gumrikê yê hemû rêveberiyên gumrikên herêmê kir yek.
Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê civînek li navenda desteyên Rêveberiya Xweser li navçeya Eyn Îsa bi beşdarbûna Hevserokên Meclisa Rêveber Bêrîvan Xalid û Ebdil El-Mihbaş, Hevserokên Desteya Aborî Welat Hac Elî û Selwa Seîd, nûnerên gumrikan yên di rêveberiya xweser de pêk anî.
Di destpêka civînê de nûnerên rêvberiyên gumrika Meclisa Rêveber li ser rewşa gumrikan û deriyên sînor û pirsgirêkên ku derdikevin nîqaş kirin.
Meclisa Rêveber ji hemû rêveberên gumrikan yên di Rêveberiya Xweser û Sivîl de xwest ku mekanîzmayeke hêsaniyê ji bo bazirganiyê, ava bikin.
Meclisa Rêveber diyar kir ku divê buhayê gumrikê li hemû rêveberiyên gumrikan bibe yek û





baca li ser welatiyan kêm bikin. Her wiha komîteyek 7 kesan ji rêveberiyên gumrikan hate avakirin…*ANHA*



# Bi helbestan çîroka Efrînê vedibêje

***Xelîl Hesen yê 14 salî ji Gundê Remedana yê Şiyê ye. Piştî ku Efrîn ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wî de hat dagirkirin ew û malbata xwe jî mîna bi deh hezaran malbatên Efrînê neçar man ji gundê xwe derketin û li Şehbayê bi cih bûn. Xelîl Hesen niha bi helbestên xwe yên ku dinivîse behsa lehengiya Efrînê û bedewiya xwezaya wê dike.***

Çiya û xwezaya Efrînê bûye jêdara helbestên gelek helbestvan û hunermendên Efrînê. Zarokê ji Erînê Xelîl Hesen bi helbestên xwe pesnê çiyayên Efrînê û bedewiya xwezaya wê dide.
Xelîl Hisên 14 salî ye û ji gundê Remadana yê girêdayî navçeya Şiyê ya kantona Efrînê ye. Xelîl tevî malbata xwe niha li navçeya Ehdas a kantona Şehbayê dimîne.
Piştî şoreşa Rojava, di sala 2012’an de Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (wê demê Saziya Zimanê kurdî) dewreyên zimanê kurdî vekirin û bi sedan hezaran welatî tev li dewreyan bûn.
Xelîl mîna hemû welatiyên Efrînê ji destpêkê ve li gundê xwe tev li dewreyan dibe û xwendin û nivîsandina zimanê kurdî fêr dibe.
Girêdayî wê demê Xelîl wiha got: “Ji destpêkê ve ez tev li dewreyên zimanê kurdî bûm û ez fêrî zimanê dayika xwe bûm. Ji ber ku şoreşa Rojava ji bo me derfetek bû ku careke din di dîrokê de dubare nabe. Li ser wê ez fêr bûm û min dest bi nivîsandina helbestan kir.”
Dayîka Xelîl gelek caran helbestên kurdî jê re digotin, ji ber wê ji helbestên kurdî gelekî hez dikir. Her wiha Xelîl bi rêya televîzyonê guhdarî helbestên kurdî dikir, ji ber wê her ku diçe hewesa wî ji bo nivîsandinê zêde dibe. Cara yekê di deh saliya xwe de dest bi nivîsê dike. Xelîl nivîsandina helbestan berdewam dike û heta niha 20 helbest nivîsandiye.



Helbestên Xelîl girêdayî destanên şehîdan, welat, bedewiya xwezaya Efrînê û çiyayên wê yên kesk, darên zeytûnê û merxan in.
Dema ku zimanê kurdî li Efrînê bi pêş diket, hemû qadên Efrînê bi pêş diketin. Gel bi hev re bi awayekî demokratîk, wekheve û li ser bingeha xwîşk û biratî jiyaneke hevpar ava dikirin. Lê artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê êrîşî Efrîn kirin û dibistanên wê kirin hedef. Ji ber wê dibistan hatin girtin. Ji ber zêdebûna asta êrîşan û pêkhatina komkujiyan şêniyên Efrînê neçar man ji Efrînê derkevin û berê xwe da kantona Şehbayê û dest bi pêngava duyemîn a Berxwedana Serdemê kirin.
Di vê rewşê de jî Xelîl dest ji nivîsandinê berneda. Lê belê pirtûkek biçûk ku ji 130 rûpelan pêk tê bi navê ‘Naskirina Bûyer û Deverên Naskirî’ dinivîse. Naveroka pirtûkê girêdayî Efrînê di dema rêjîma Baas de, 6 salên



demokrasiyê û jiyana hevpar di dema Rêveberiya Xweser de û dema dagirkirina Efrînê ji aliyê dewleta Tirk de. Xelîl di nava 3 mehan de ev pirtûk amade kiriye û ji bo çapkirinê ew şandiye herêma Cizîrê.
Xelîl ji dema derketina ji Efrînê û heta niha 6 helbestên ku tê de tevî şerên ku çiyayên Efrînê bûne şahidê berxwedana şervanên YPG/YPJ’ê, êş û azarên ku di encama êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê de kişandine, rave dike.
Niha Xelîl xwendina xwe bi zimanê dayikê di refa 8’an de li dibistana navçeya Ehdas a navîn didomîne…*ANHA*

## Nivîsên Hawar, Ronahî û Roja Nû hatin çapkirin

Weşanên Wardozê bi navê “Seta Folklora Kovaran” hemû nivîsên folklorîk ên kovara Hawar, Ronahî û Roja Nûyê tesnîf û çap kirin. Set ji sê pirtûkan pêk tê. Edîtor û xwediyê Weşanxaneya Wardozê Bahoz Baran da zanîn ku nivîsên folklorîk ên Hawar, Ronahî û Roja Nû rêya wan ronî dikin û bi tesnîfkirinê şewqek li folklora roja îroyîn zêde kirine.
Weşanxaneya Wardozê ku li Amedê xebatên çapkirina pirtûkan bi rê ve dibe, ji bo wêjeya kurdî mohra xwe li bin xebatek din xist. Weşanxaneya Wardozê ku tenê xebatên der barê folklora kurdan de çap dike, setek nû ya ji sê pirtûkan pêk tê weşand. Di van her sê pirtûkan de hemû nivîsên têkildarî folklora kurdan ên di kovara Hawar, Ronahî û Roja Nû de hatine tesnîfkirin. Folklora Hawarê ji aliyê Mehpûs Serhedî, folklora Ronahiyê ji aliyê Mem Mukriyanî û folklora Roja Nû jî ji aliyê Rênas Xendekî ve hatine tesnîfkirin.

### KOVARA HAWARÊ

Di pirtûka “Kovara Hawarê” de hemû nivîsên folklorik ên mîna “çîrok, fabl, xebroşk, destan, efsane, kilam, stran, lorî, lavij, gotinên pêşiyan û tiştanok û hin nivîsên li ser eşîr û erdnîgariyê hatine tesnîfkirin.

### KOVARA RONAHÎ

Di pirtûka “Kovara Ronahiyê” de hemû nivîsên wek “çîrok, fabl, xebroşk, destan, pêkenî û nivîsên li ser eşîr, bawerî, nêçîr û salnameya kurmancî hatine tesnîfkirin.

### KOVARA ROJA NÛ

Di pirtûka “Kovara Roja Nûyê” de jî hemû nivîsên folklorîn ên mîna “Çîrok, fabl, kilam, stran, payîzok, lorî, destan, dûrik, qewl, hin gotinên pêşiyan û mamik hatine tesnîfkirin.
Her wiha di dawiya hersê pirtûkan de jî ji bo têgihiştina deqên folklorîk ferhenga folklorê jî li dawiya wan hatiye zêdekirin.
Edîtor û xwediyê Weşanên Wardozê Bahoz Baran der barê xebata hersê pirtûkan de axivî û da zanîn ku dema ew dibêjin Weşanxaneya Wardozê ewil folklor tê bîra mirovan û got: “Folklor tiştekî zindî ye. Folklora di roja me îro de û folklora zemanê berê hatiye qeydkirin û hatiye nivîsîn jî heye. Em tiştên di roja me de hene berhev dikin. Xwe digihînin berhemên xwe yên dîrokî yên folklorîk. Lewra ew nivîsên folklorîk di nava tekstan de fetisîne. Lazim e ji bo mirov tiştekî ji wan tekstan fêm bike bên derxistin û xwendin.”




### XEBATÊN WAN RÊYA ME RONÎ DIKIN

Baran destnîşan kir ku Celadet Elî Bedîrxan, Kamûran Elî Bedîrxan yanî malbata Bedîrxaniyan gelek qîmet daye ziman û wêjeyê û got: “Me di nava xebatên wan de ronahiya folklorê jî dît. Gelek xebatên folklorê di nava xebatên wan de hene û her yek li cihekî belav bûye. Me xwest wan nivîsên folklorîk bînin ber hev û tesfîr bikin. Em fam bikin ka di Kovara Hawarê, Ronahiyê û Roja Nû de li ser navê folklorê çi hatiye kirin. Me bi vê minasebetê berê xwe da hersê xebatan. Ji çîrokan bigire heta xebroşk, destan, kilam, ayîn, gotinên pêşiyan û gelek nivîsên cûr bi cûr ên folklorîk hatine bicihkirin. Hersê hevalên me li ser vê xebatê sekinîn û yek bi yek nivîs tesnîfkirin.”

### HAWAR, RONAHÎ Û ROJA NÛ, ŞEWQ DIDIN FOLKLORÊ

Baran behsa hersê xebatên tesnîf kirine kir û wiha dewam kir: “Derdê me jî yek jê ew e, em dixwazin nivîsên folklorîk ên wê çaxê bi rastnivîsa roja me bi rehetî bên xwendin. Yanî bila însan tê de asê nemînin û bikaribin bixwînin da ku tiştekî jê fêm bikin. Rastnivîsa hersê pirtûkan me li gorî roja me çêkir. Lê me guhertinek di peyvê wan de çênekir. Xebatên folklorîk çawa hatibe gotin, divê wisa bê nivîsîn. Mirov nikare dest bidê û ew qaydê ewil a folklorê ye. Mebesta me ew bû ku însan bizanibin xebatek di wan kovaran de hatiye kirin. Lê ne li ber çavan e. Me niha ronahiyek û şewqek da ser folklora Hawar, Ronahî û Roja Nû.”

### NE KOPÎ, ME YEK BI YEK NIVÎSAND

Baran diyar kir ku wan navê “Seta Folklora Kovaran” li xebata xwe kiriye û got: “Em dikarin bêjin salek bû em li ser vê projeyê dixebitîn. Me nexwest em wan kovaran kopî bikin. Me yek bi yek nivîsand. Hevalên me wextek zêde dan nivîsandinê. Beriya niha jî Kovara Hawar û Ronahiyê hatibû çapkirin, lê heta niha tu kesî Roja Nû çap nekiriye. Roja Nû wek kovarek winda jî xûya dikir. Me di dawiya her pirtûkê de ji bo fêmkirina peyvên folklorîk jî beşa ferhengê nivîsandiye.”

## Xebata Weşangeriyê



Derwêş M. FERHO

Destpêka weşangeriyê li Beljîka di çarçeweya xebata me de di dawiya salên heftê de dest pê kir. Dema bingehê Enstituya Kurdî li Brukselê, ‘Têkoşer’ Yekîtiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljîka, hat danîn pêdiviya peydakirin û belavkirina weşanên li ser pirsgirêka Kurdistanê hebû. Heta ji me hat em li weşanên vê mijarê geriyan û li hev dan hev. Lê pirsgirêk bi temamî çareser nebû. Ji ber ku hemû weşanên me bikariya peyda bikin bi Kurdî, Turkî û beşekî piçûk jî Erebî û Farisî bûn. Vê yekê projeya destpêkirina weşanên bi zimanên welatê ku em tê de ne danî ber me. Lê derfet jî kêm bûn.
Paş damezrandina rêxistina xwe di sala 1978 de agahdariyên giştî bi zimanê Frensizî hat amadekirin. Paş demeke kurt Hollandiya wê xebatê jî amade bû û bi derfetên sînorkirî her du bi stensîlê li ser kaxezên A4 hatin çapkirin. Mekîna stensîlê jî ya rêxistineke dost bû. Me bes kaxez û kartona qalik stend û xwe bi xwe rêz dikir û weşand. Ev du berhem bi sedan heb hatin belavkirin. Di dawiya salên heştê de Ingilîziya wê jî hat amadekirin û li pey hev bi her sê zimanan ji nuh ve wek pirtûk di çapxaneya Zanîngeha Leuven (ACCO) de, lê dîsa bi alîkariya sazî û kesayetiyên dost, ji çapê derketin.
Bi wê xabata me, her çiqasî têr nedikir, valahiyek tijî bû. Çend pirtûkên ji aliyê Kurdan hatibûn amadekirin û dijî derew, xap û înkara dewletên dagîrker di dest me de bûn. Lê berdewama vî awayê xebatê giring bû. Di wê demê de li welêt derfetên dîtina weşanxaneyên Kurdî nebûn. Em li hemû welatên Ewropa bi saziyên Kurdistanî re ketin têkiliyan. Lê mixabin tu derfet nehatin dîtin ku pêdiviyek çareser bibe. Saziyên ku hebûn di bin sîwana îdeolojî û bernameya partiyên siyasî de karê xwe dikirin û ne mimkin bû tev wan weşanên xwe bidin çapkirin. Û ev pirsgirêk ne bes li ba me hebû. Hin saziyên din li welatên din ji kêmasiya derfetan bi awayekî qaçax li welatên Sosyalîst, ji sedema erzaniyê, çend weşan dane çapkirin. Bi gelek dijwariyan ew weşan bi qaçaxî dianîn Ewropa Rojava û belav dikirin.
Bê goman, di wê navberê de em li derfetên nasîn û pejirandina xebata xwe di fermiyetê de digeriyan. Xebateke rêk û pêk, bi hesab û berpirsiyarî hat rêvebirin. Hêdî hêdî û bi sebir ev yek jî pêk hat û li cem gelek xebatên din derfetên weşanan ferehtir bû. Peywendiyên bi dezgehan, siyasetvanan, akademisyen û medya re kete çarçeweyeke din. Êdî xebat bi awayekî profesyonel û rêk û pêk dihat rêvebirin.
Paş destpêka salên 1990î li di nav xebata me ya pirr alî de giringiya weşanan dom kir. Bi zimanê Kurdî, Hollandî, Frensizî, Ingilîzî, Danîmarkî û Turkî li ser mijarên cuda pirtûk hatin weşandin. Pirraniya van weşanan li Beljîka pêk dihat. Lê hin caran jî ji bo saha belavkirinê li welêt ferehtir bû me hin pirtukên xwe li welêt dane çapê. Ji ber ku weşanxaneyên Kurdistanî peyda bûbûn û dijwarî hebe jî çap pêk dihat. Mijarên naveroka weşanên me li ser pirsgirêka Kurdistanê ye û bi zimanên cuda ye. Di aliyê din de me rê da nivîskar û lêkolînerên Ewropî jî. Ango, hedefa me ew bû ku em bi zimanê wan, ji aliyê hemwelatiyên wan ku me li derdorê xwe dane hev, hîtabê wan bikin. Me ev rê dar ber xwe ji ber pêdivî hebû û hê jî heye. Bi vê yekê me, têr neke jî, rê li ber derew, xap û înkara dewletên dagirker girt.
Xebata di vê çarçeweyê de berdewam e û bi derengî be jî encamên erênî ji bo doza me peyda dike.

**Piştî ku welatiyên Efrînê ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk li Şehbayê bi cih bûn, Meclisa Tenduristiyê ya Efrînê bi armanca pêşkêşkirina xebatên tenduristiyê nexweşxaneyeke biçûk bi navê Avrîn vekir. Doktorê Nexweşxaneya Avrîn Dr. Azad Sebrî diyar kir ku rojane zêdeyî 600 nexweş diçin nexweşxaneyê û ew ji ber kêmbûna dermanan zehmetiyan dikişînin.**



# Nexweşxaneya Avrîn bê navber dixebite



Tevî derfetên kêm jî Nexweşxaneya Avrîn rojane ji bo sedan welatiyan xizmeta tenduristiyê dike. Piştî ku welatiyên Efrînê ji ber êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk li Şehbayê bi cih bûn, Meclisa Tenduristiyê ya Efrînê bi armanca pêşkêşkirina xebatên tenduristiyê nexweşxaneyeke biçûk bi navê Avrîn vekir.

Li kantona Şehbayê Nexweşxaneya Avrîn tekane nexweşxane ye. Mehane derdora 20 hezar nexweşan derman dike. Rojane zêdetirî 600 nexweş diçin nexweşxaneyê. Di Nexweşxaneya Avrîn de 141 kadroyên tenduristiyê ji bijîşk, hemşîre, karker û endamên rêveber 24 saetan dixebitin. Di nav de 28 bijîşkên pispor, tevî tîma destwerdana lezgîn 70 hemşîre û 43 endamên rêveber û karmend di beşên cuda de dixebitin.

**GELEK BEŞÊN NEXWEŞXANÊ HENE**

Nexweşxane ji beşên çav, hestî, zarok, pitik, guh û poz û qirik, niştergerî, hundirîn, gurçik, pêçan, radyasyon, taqîgeh, dermanxane û çavdêriya awarte pêk tê.

Li gorî berpirsên nexweşxaneyê, alavên tenduristiyê yên pêwîst wekî alava radyasyonê ya tebeqî mihwerî û qetermîzên pitikan kêm in. Lê di van demên dawîn de rêveberiya nexweşxaneyê 4 qetermîzên pitikan peyda kirine lê dîsa jî ev hejmar kêm dimîne. Her wiha hinek derman li nexweşxaneyê jî kêm in.

Girêdayî mijara dermankirina welatiyan û pirsgirêkên li pêş nexweşxaneyê, Eendamê Komîteya Tenduristiyê ya Efrîn û Şehbayê Dr. Azad Sebrî wiha got: "Wek Komîteya Tenduristiyê me hemû kadroyên tenduristiyê li kantona Şehbayê ji bo dermankirina welatiyan bi rêxistin kirin. Em li rex gelê xwe li Şehbayê li ber xwe didin. Rojane di navbera 600-700 nexweşan de serdana nexweşxaneyê dikin. Lê di dermankirinê de ji ber kêmbûna hinek dermaman em zehmetiyan dikişînin."

Dr. Sebrî diyar kir ku nexwşxane bê pere xebatên tenduristiyê ji welatiyan re pêşkêş dike. Lê zêdebûna hejmara nexweşan li gel kêm alîkariyê rêxistinan, zexteke mezin li nexweşxaneyê dike. Dr. Sebrî destnîşan kir ku tenê Heyva Sor a Kurd alîkariya wan dike… *ANHA*

# Li Dêrazorê pêngava paqijkirina gundan

Komîteya Xizmetguzariyê ya Meclisa Sivîl a Dêrazorê bi hevkariya şaredariyan hemleya paqijkirina gundên rojhilat û rojava yên rizgarkirî didomîne. Parêzgeha Dêrazorê ji ber dagirkeriya çeteyên DAIŞ`ê di nava 4 salan de gelek zor û zehmetî dît. Aliyê xizmetguzariyê hatibû paşguhkirin û çop û bermahiyên şer, di kolanan de kom bûbûn. Sala 2017`an şervanên QSD`ê dest bi hemleya Bagera Cizîrê kir. Gundewarên rojhilat û herêmên rojavayê gundewarên Dêrazorê rizgar kirin. Paşê Meclisa Sivîl a Dêrazorê hate avakirin. Meclisa Sivîl a Dêrazorê 1`ê Tîrmeha derbasbûyî dest bi hemleya paqijiyê kir û hemle heta niha bi alîkariya şaredariyan didome.

Li gorî berpirsên Komîteya Xizmetguzariyê heta niha gundewarên rojava, rojhilat û bakurê Dêrazorê hatine paqijkirin. Her wiha destnîşan kirin ku wê dest bi paqijkirina herêmên ku şaredarî û navendên xizmetguzariyê li wan hatine vekirin, bikin. Tê payîn ku wê hemleya wan di dawiya meha Adarê ya 2019`an de were bidawîkirin. Berpirsan diyar kir ku 45 dibistan ji gundewarên rojava û 65 dibistan ji gundewarên rojhilatê Dêrazorê ji bermahiyên şer û çopê hatine paqijkirin.

Gerînendeyê pêngava paqijkirinê Yasir El-Elî diyar kir ku wan pirraniya dibistanên gundewarên rojava û rojhilatê Dêrazorê paqij kirine û hemleya wan heta niha didome…*ANHA*



# Koçber bi derfetên xwe hewl didin rewşa xwe baştir bikin

Ev 2 sal e koçberên li kampên Minbicê di nava şert û mercên zehmet de roja xwe derbas dikin. Rêxistinên mirovî alîkariya koçberan nakin. Koçber be jî hewl ddin bi derfetn xwe rewşa jiyana kampê baştir bikin.


Kampa Minbicê ku ev 2 sal e ava buye zehmetiyên jiyanî yên li kampê dewam dikin. Kampa Minbicê ji 2 beşan pêk tê. Di beşa yekem de 340 kon û di beşa duyem de 445 kon hene. Hejmara koçberan li kampê zêdeyî 5 hezar û 600 î ye.

Hêjmareke zêde koçber jî piştî ku QSD'ê herêmên wan ji DAIŞ'ê rizgar kir, vegerîn malên xwe. Piraniya koçberên ku niha li kampê ne, ji Meskene û Dêr Hafir in ku di bin serweriya rêjîma Sûriyê de ne. Ev koçber ji ber ewlehî û aramiya li herêmê di kampê de mane.

Lê ji ber ku rêxistinên navnetewî alîkariya koçberên li kampê mane nakin, zehmetiyên jiyanî dibînin. Koçber jî hewl didin bi derfetên xwe pirsgirikên heyî çareser bikin. Girêdayî mijarê koçbera bi navê Yusra El-Şelbî destnîşan kir ku wan ji bo parastina konan cihên biçûk ji heriyê ava kirine. Ji ber ku eger kon bişewite wê tu cihekî din ku xwe lê star bikin, nemîne. Yusra destnîşan kir ku zarokê wê ji ber sermayê nexweş ketine û bi êvaran ji ber kuxikê nikarin xew bikin…*ANHA*



**RAMANÊ RÊBERTIYÊ**



## Rastiya Kurd -2-

Abdulah Ocalan

Di van sîh salên dawiyê de têkoşîna PKK'ê bi awayekî berbiçav meşandiye ji bo Kurdan pirsgirêka hebûnê bû. Bi awayekî ev têkoşîn ji bo zelalkirina pirsa 'Kurd hene yan tine ne', hatiye meşandin. Ji aliyan aliyekî bi awayekî întîharwarî gotiye heye, aliyê din jî gotiye tineye. Ji vê jî wêdetir a mirov ji ber fedî dike ew e, di şêst salên beriya vî sîh salî de entelektueliya Kurd jî bi îspatkirina hebûna Kurd re mijûl bûye. Bêguman ji bo ferd û civakekê guftûgokirina hebûnê rewşeke gelekî bi tehlûke û rezîl îfade dike ku ev jî îşaret bi xeteke zirav a di navbera man û nemanê de ango di navbera jiyan û mirinê de dike. Di dîrokê de ti hebûna civakî neketiye vê rewşê yan jî pirr kêm hebûnên civakî bi hovîtiyeke bi vî rengî re rûbirû bûne. Ti hebûna civakî bi qasî Kurdan nekirine ku ji xwe fedî bike û înkara xwe qebûl bike an jî rewşeke evqasî rezîl bi serê pirr kêm hebûnên civakî de hatiye. Eger mirov bibe Kurd dibe tiştekî mîna bermahiya komeke ku welatê xwe bi xwe tineye, pênc pere nake, bêperetî û ew wekhev e, timî bêkar e, bi her heqdestê dixebite, timî ji bo debarê li ber xwe dide, pêdiviya xwe ya çandî ji bîr dike, ji bo pêdiviyên xwe yên maddî dûrî aqilan hewl dide, li dayikniştimana NAN (li dayikniştimana şoreşa cotkariyê ya neolîtîkê) bê NAN dimîne.

Min behsa trajediya xwe kiribû ka çawa bi dibistana pêşî ya asîmîlasyonê dest pê kir. Dibistana seretayî li şûna zimanê min ê dayikê bi zimenekî din ders dida. Mîna ku ez bi tehlûkeya ji vê dibistanê bê dihesiyam. Bi wê zarokatiyê dixwestin ez dev ji zimanê xwe berdim, ez ji hebûna xwe bigerim. Gelo, ez ê ji hebûna xwe ango Kurdîtiya xwe bigeriyama, wê bikirina jê bigerim? Diyardeya Kurd an jî pirsgirêka Kurd ji bo min bi vî awayî dest pê kiribû. Hebûnek an jî pirseke salên dûrûdirêj bêbersiv di nava dilê min de ez nerehet kirim... Min zimanê xwe ji dest dida û di binê vê de jidestdaneke mezin a hebûnê hebû. Min çi ji dest dida? Ev pirseke pirr zor û zehmet bû ku min bersiva wê bidiya. Kurd bûbû hebûneke bi pirsgirêk ku parastina wê gelekî zor û zehmet bû. Ya diqewimî, ne hebûna min, lê lerz û taya min a li ber qedandinê bû; bersivên bîrbirî û serwextbûyî nebûn, gulokeke pirsgirêkan bû ku her diçû mezin dibû û mirov dîn dikir.

Di serê salên 1975'an de min wisa xîtabî M. Hayrî Dûrmûş dikir, mîna ku min bersiva guloka pirsên min dipelixandin dîtibû. Bersiva pirsan weke pêşnûme hat nivîsîn û devê min vebû. Eşkere ye ku bersiva min der barê hebûneke pêjna wê xeyal meyal hebû, xwe weke sîhekê weke şopekê dida hiskirin, îdeayeke devkî bû. Min yeqîn dikir ku mirov di pencereya çînî û rizgariya neteweyî ya cîhanê de binêre wê bibe bersiv. Min bersivên gelekî zêde îdealîst didan. Ma ne şablonê heqîqeta nû sosyalîzma pêkhatî bû. Mirov bi elîfbaya wê zanîbûya ya din bi xwe dihat. Bêguman nêzîkatiyeke bi vî rengî li hemberî bandora lîberalîzma alatûrka, faşîzma serkorker û înkarker panjehr bû. Mirov negihanda heqîqetê jî dikarîbû nehişta mirov bi jehrê bikeve. Li dijî qirkirina çandî di şerê hebûnê de ango di şerê man û nemanê de wê bi kêr bihata.



# Rêziknameya desteyan tê amadekirin

**Xebatên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê navber dewam dikin. Hevseroka Desteya Rêveber a Rêveberiya Xweser Bêrîvan Xalid diyar kir wê di nava 10 rojan de rêziknameya deste û komîteyên girêdayî rêveberiyê amade bibe. Bêrîvan Xalid da zanîn ku heta niha 3 desteyan rêziknameyên xwe amade kirine.**

Hevseroka Desteya Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bêrîvan Xalid diyar kir wê herî zêde di 10 rojan de rêziknameya deste û komîteyên girêdayî rêveberiyê amade bibe.

Di navbera 12-24'ê Mijdarê de bi armanca koordînekirina kar û xebatan û zêdekirina hevkariyê di navbera komîteyan, desteyan û Meclisa Rêveber de, meclisê rêzecivîn ji hemû desteyan û komîteyan di rêveberiyên xweser û sivîl de li dar xistibû. Di civînan de bi armanca danîna rêziknameyekê li gorî yek pergalê meşandina kar, biryara avakirina komîteyan hate dayîn.

Girêdayî hewldanên ji bo danîna rêziknameya kar a hemû deste û komîteyên girêdayî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hevseroka Meclisa Rêveber Bêrîvan Xalid axivî û diyar kir ku her komîteyek piştî rêziknameya xwe bi dawî bike wê ji bo nirxandin û erêkirinê pêşkêşî hevserokatiya Meclisa Rêveber bike. Bêrîvan da zanîn ku heta niha 3 desteyan; Desteya Rêveberiyên Herêmî, Desteya Darayî û Desteya Ciwan û Werzîşê rêziknameyên xwe bi dawî kirine û radestî Meclisa Rêveber kirine.

Di berdewama gotinên xwe de Bêrîvan destnîşan kir ku Meclisa Rêveber di 6'ê Kanûnê de ji bo lezdayîna xebatên amadekirina rêziknameyan herî zêde di 10 rojan de bi desteyan re civiyaye.

Her wiha Bêrîvan derengmayîna hinek desteyan di amadekirina rêziknameyê de spart cudabûna sazûmaniya rêveberiyê ya hinek komîteyan.

Di dawiyê de Hevseroka Desteya Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bêrîvan Xalid destnîşan kir ku armanca wan ji vê pêngavê yekbûna xebatên komîteyan li hemû herêmên Rêveberiya Xweser û mekanîzmaya kar û derbaskirina astengiyan e…*ANHA*



# Bi hezaran kes nikarin bên dermankirin



Xebatkara Nexweşxaneya Avrînê ya Kantona Şehbayê Roşîn Şêxo diyar kir ku ji ber derfetên kêm li Şehbayê bi hezaran mirov nikarin bên tedawîkirin û wiha got: "Bandora koçberiyê û derfetên kêm dibe sedema pirsgirêkên girîng ên tenduristiyê. Şertên dijwar ên li Şehbayê bandorek neyînî li ser tenduristiyê dike. Ji bo ev tengasî ji holê rabe jî rêxistinên mafên mirovan alîkariyê nakin. Her wiha rejim jî ji bo tedawiya gelê li Şehbayê bi cih bûne dibe asteng."

Gelê Efrînê yê ku li Şehbayê bi cih bûne ji ber derfetên kêm bi pirsgirêk û zehmetiyên cur be cur rû bi rû dimînin. Ji van pirsgirêk û zehmetiyan yek jê tenduristî ye. Ji ber alavên kêm ên ji bo tenduristiyê û derfetên kêm di warê tenduristiyê de kêmasî tên jiyîn.

Têkildarî mijarê xebatkara Nexweşxaneya Avrînê ya Şehbayê Roşîn Şêxo da zanîn ku ji bo xizmeta tenduristiya mirovên li Şehbayê ew tiştên ku ji destên wan tê dikin lê dîsa jî ev têr nake û wiha got: "Nexweşî her ku diçe zêde dibin. Hinek nexweşiyên giran ji ber derfetên kêm nayên tedawîkirin û ev yek bandorek neyînî di heman demê de li ser derûniya gel dike. Ji bo ev pirsgirêk çareser bibe pêdivî ji piştevaniya navneteweyî heye. Divê hemû kes bi hestiyarî tev bigerin da ku ev pirsgirêka tenduristiyê çareser bibe."

Roşînê diyar kir ku cureyên nexweşiyan ên wekî pençeşêr, îltihaba kezebê her ku diçe zêde dibin û wiha got: "Ji bo nexweşî zêde nebin pêdivî ji piştevaniyê heye. Gelek dermanên ji bo tedawiyê em nikarin peyde bikin ev jî dibe sedem ku nexweşî tedawî nebe. Herî zêde jî zarok zehmetiyan dikişînin. Jinên ducanî jî zêde ne û ji ber derfetên kêm ew jî baş nikarin tedawî bibin. Dermanên nexweşiyên giran em dixwazin ji Helebê bînin lê rejim dibe asteng. Gelek kesên nexweş jiyana xwe ji dest dan."

Xebatkara Nexweşxaneya Avrînê Roşîn Şêxo wiha dawî li axaftina xwe anî: "Bandora koçberiyê û derfetên kêm dibe sedema pirsgirêkên girîng ên tenduristiyê. Şertên dijwar ên li Şehbayê bandorek neyînî li ser tenduristiyê dike. Ji bo ev tengasî ji holê rabe jî rêxistinên mafên mirovan alîkariyê nakin. Her wiha rejim jî ji bo tedawiya gelê li Şehbayê bi cih bûne dibe asteng. Nexweşî her ku diçe zêde dibin. Hinek nexweşiyên giran ji ber derfetên kêm nayên dermankirin û ev yek bandorek neyînî di heman demê de li ser derûniya gel dike. Ji bo ev pirsgirêk çareser bibe pêdivî ji piştevaniya navneteweyî heye. Divê hemû kes hestiyarî tev bigerin da ku ev pirsgirêka tenduristî çareser bibe."…*JINNEWS*

# Li Taxa Şêxmeqsûd têkoşîna jinekê

Di dema êrîşên li ser Şêxmeqsûdê de jina bi navê Nesrîn Cafo alîkariya şêniyên taxê kir û piştî pîşeya xwe bi pêş xist pêdiviyên şêniyan pêk anî.

Nesrîn Cefo dayika 6 zarokan e. Temenê wê 41 sal e, piştî ku xwendin berda, ji dayika xwe fêrî dirûnkariyê bû. Nesrînê ji bo fêrî cildirûnê bibe kete nava gelek hewldan.

Bi demê re xwsteka Nesrînê bi pêş ket û ji welatiyên taxê cilên folklorîk û cilên zarokan dirûtin. Di dema şerê Şêxmeqsûdê de Nesrîn ranewestiya, berevajî hîn zêde alîkariya welatiyan kir ku li ser axa xwe bimînin. Ji ber şer û ambargoya li ser taxê welatiyan nikaribûn cil ji zarokên xwe bikirrîna, berê xwe dan Nesrînê. Her wiha dirûtina cilên jinên ku ji bo amadekirina xwarina şervanan di çeperên şer de dixebitin, girt ser xwe û ji wan re didirût. Her wiha ji ber pisporiya xwe Nesrînê cilên komên govendê jî dirût.

Nesrîn Cafo diyar kir ku ew bi piştgiriya dayîka xwe di vî karî de pêşketiye...*ANHA*



# Mala jin pirsgirêkên jinan çareser dike



Mala Jinan a kantona Girê Spî ji bo perwerdekirina jinan û çareserkirina dozên jinan bê navber dixebite. Li gorî rêveberiya mala jin di demên dawîn de hejmara pirsgirêkên ku têne navendê kêm bûye.

Çeteyên DAIŞ'ê dema ku kantona Girê Spî dagir kiribû, jin di civakê de ji her tiştî bê par hiştibûn. Piştî ku kanton ji aliyê şervanên YPG û YPJ'ê ve hate rizgarkirin, jinan ji nû ve xwe bi rêxistin kir, komîn û meclisên xwe ava kirin. Heya niha 35 komîn û meclisên jinan hatine avakirin. Jinên kantonê her wiha saziyên xwe yên xweser vekirin, jin perwerde kirin û pirsgirêkên wan çareser kirin. Yek ji van saziyan jî Mala Jin e.

Di destpêka vekirina Mala Jinan de hema bêje mehê 50 pirsgirêk diçûn Mala Jinan, pirraniya wan girêdayî zewicandina di temenê biçûk de bûn. Endamên Mala Jinan ji bo çareserkirina pirsgirêkan xebateke bênavber dike. Li gorî endamên Mala Jin di demên dawîn de hejmara pirsgirêkên têne cem wan kêm bûne.

Rêvebera Mala Jinan a kantona Girê Spî Fadiya Şerîf Xelîl li ser mijarê wiha got: "Heya niha li gund û bajarokên kantonê me 35 komîn ava kirin, her komînek civînên xwe asayî li dar dixe. Me roleke erênî di perwerdekirina jinan û pênasekirina rola wan de lîst."

Fadiya Şerîf destnîşan kir ku pirraniya pirsgirêkên ku têne cem wan, girêdayî zewicandina di temenê biçûk de ne, pirrkirina hevjînan e û da zanîn ku pirraniya pirsgirêkan bi rêgeza edaleta civakî hatin çareserkirin.

Fadiya Şerîf Xelîl di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Wek Mala Jin em mafên jinan diparêzin û wan perwerde dikin da ku rola xwe di civakê de bilîzin."…*ANHA*

# Li pêş Kurdan an yekîtî an jî têkçûn

**Nûnerên partiyên siyasî yên li Rojavayê Kurdistanê girtina buroyên Tevgera Azadî li Başûrê Kurdistanê ji aliyê YNK'ê de şermezar kirin û xwestin ku YNK ji vê şaşiyê vegere. Her wiha nûnerên partiyan ji bo avakirina yekîtiya netewî ji banga lidarxistina kongreya netewî li aliyên siyasî yên Kurd kirin.**

Rayedarên 3 partiyên Kurd ên li Rojava gotin, "Kurd divê bi dewleta Tirk a faşîst re nebin yek, divê bi hev re tevbigerin û yekîtiya xwe ya neteweyî pêk bînin."
Rayedarên Partiya Komunîst a Kurdistanê, Partiya Lîberal a Kurdistanê û Partiya Çep a Demokratîk a Kurdistanê yên



li Rojavayê Kurdistanê, girtina buroyên Tevgera Azadî, yekîtiya netewî û tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nirxandin.

**LI ROJAVA MAFÊ HERKESÎ YÊ SIYASETÊ HEYE**

Sekreterê Giştî yê Partiya Komunîst a Kurdistanê Necmeddîn Melle Omar girtina buroyên Tevgera Azadî ji aliyê YNK'ê de şermezar kir.
Omar anî ziman, li pişt êrîşên li dijî Tevgera Azadî ya li Başûrê Kurdistanê Amerîka û Tirkiye hene û got, "Şaş e ku buroyên Tevgera Azadî ji aliyê YNK'ê ve hatine girtin. Endamên Tevgera Azadî ked û berdêl dane û ev tevger ava kirine. Nêrînên Tevgera Azadî ne mecbûr e bişibe nêrînên PDK ê YNK'ê.
Partiyên me yên li Rojava xwedî nêrînên cuda ne. Lê belê mafê her kesî heye ku siyasetê bike. Kes partiya kesî nagire. Mafê her kesî



ye ku nêrîna xwe bi rengekî azad biparêze... Nabe ku mafê siyasetê ji destê Tevgera Azadî bê girtin."

**BÊYÎ KONGRE Û YEKÎTIYA NETEWEYÎ NABE**

Necmeddîn Melle Omar işaret bi girîngî û lezgîniya yekîtiya neteweyî kir û got, "Li gorî berjewendiyên Kurdan e ku partiyên Kurd di çarçoveya kongreya neteweyî de li hev bicivin. Rejîmên Tirkiye, Amerîka, Îran, Sûriye li gel cudahiya nava xwe jî, li gel nêrînên cuda û nakokiyên cidî jî, dema mijar Kurd be dibin yek. Em çima nikarin bibin yek?"

**AN YEKÎTÎ AN TÊK ÇÛN**

Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Lîberal a Kurdistanê Ferhad Telo jî anî ziman, girtina buroyên Tevgera Azadî daxwaza dewleta Tirk e û got, "Em vê yekê weke êrîşekê li dijî Kurd û Kurdistanê dibînin. Ji kîjan alî ve bê nirxandin wê were dîtin ku têkçûna Kurdekî tê wateya têkçûna gelê Kurd. Kurd ya wê bi hev re têk biçin, ya jî bi hev re bi ser bikevin. Lewma, sedem çi dibe bila bibe girtina buroyên Tevgera Azadî rast nîne, em qebûl nakin. Kîjan partî dibe bila bibe, helwesta me zelal e."
Telo di dewama axaftina xwe de bi bîr xist ku hikumeta Başûrê Kurdistanê nehişt heyetek ji Başûrê Kurdistanê tevlî Forûma



Paqijiya Etnîkî û Guhertina Demografiya Efrînê bibe û got, "Efrîn niha birîneke di dilê Kurdan de. Êşa wê ne kêmî ya Helebçeyê ye. Ji ber vê yekê der barê Efrînê de divê em xwedî helwest bin. Efrîn ne tenê ji bo Rojava, ji bo hemû Kurdan girîng e. Em, astengiya li pêşiya hatina heyetê hate derxistin rast nabînin. Kurd divê hev parçe nekin, divê helwesteke çêker ji bo hev nîşan bidin."
Telo bang li PDK û YNK'ê kir ku ji bo pêkhatina Kongreya Neteweyî ya Kurd gavan biavêjin û wiha dewam kir: "Kongreya Neteweyî dermanê pirsgirêkên sedan salan ên Kurd û Kurdistanê ye."

**DIVÊ YEKÎTÎ PÊK WERE**

Sekreterê Giştî yê Partiya Çep Demokratîk a Kurdistanê Salih Gedo jî ji bo vekirina buroyên Tevgera Azadî bang li YNK'ê kir û got: "Ji sala 1975'an û vir ve têkiliyên me bi YNK'ê re hene. Em YNK'ê weke partiyeke welê nas dikin ku li Kurdistanê xwedî li nasnameya neteweyî derdikeve. Dewama hêzên Kurdistanî ye û ji bo çar parçeyên Kurdistanê xwedî vê taybetmendiyê ye. Bi dîtina min, afirînerê vê siysetê Mam Celal Talabanî ye. Di vê mijarê de tecrûbeyeke me jî ya demdirêj heye. Bakur, Rojhilat, Başûr, Rojavayê Kurdistanê ferq nake, em her tim bûn destek û hîn jî vê desteka xwe didomînin.
Der barê bûyerên niha li Başûrê Kurdistanê diqewimin bi taybetî yên li Silêmaniyeyê, em dibêjin; roj ne roja şerê nava malê ye. Divê li pêşiya yekîtiya neteweyî ya gel û partiyên Kurdistanê nebin asteng. Her kes pê zane ku biryara girtina partiyê ji aliyê hêzên netewe dewletê ve hatiye girtin. Em jî dibêjin; li cewhera xwe vegerin."

**SEROK APO DIVÊ SERBEST BE**

Salih Gedo bal kişand ser tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û got, "Ne tenê gelê Kurd azadiya Birêz Ocalan dixwaze. Hemû gelên cîhanê daxwaza azadiya Serok Apo dikin. Ev yek daxwaza hemû gelên alîgirê azadî, demokrasî û mafên mirovan e. Hemû dewletên cîhanê bi taybetî Amerîka, Rûsya û Yekîtiya Ewropayê divê êdî ji dewleta TC a faşîst re bêjin, 'êdî bes' e. Divê Serok Apo êdî azad be û li nava gelê xwe bi rengekî azad bixebite."…*ANF*

## Zilma wan hebe, a me jî berxwedan heye

Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk, bal kişand ser zextên di demên dawî de zêde bûne û got: "Birêz Ocalan çi dema biaxive, dengê wî yê ji bo aştî, demokrasî û azadiyê bilind dibe. Ji bo ku civak vî dengê nebihîse, tecrîdê girantir dikin. Lê ger dîrokek wan a zilamê hebe, a me jî dîroka me ya berxwedanê heye."
Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem a Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û Parlamentera Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ya Colemêrgê Leyla Guven a bi boneya şermezarkirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan da destpêkirin di roja 32'yan de berdewam dike. Hevserokê KCD'ê û Parlamenterê HDP'ê yê Agiriyê Berdan Ozturk tecrîdkirina Rêber Ocalan û çalakiyên greva birçîbûnê nirxand.
Ozturk, bal kişand ser "komploya navneteweyî" ya di sala 1999'an de li dijî Ocalan pêk hat û wiha axivî: "Bi vê tecrîda li Îmraliyê, armanc dikin ku ramanên Ocalan ên alternatîfa modernîteya kapîtalîst in li Rojhilata Navîn belav nebin. A rastîn komploya li dijî Ocalan kirin dewrê, negiha armanca xwe. Birêz Ocalan bi berxwedana xwe komplo pûç kir.




Birêz Ocalan ji bo azadî, aştî û demokrasiya gelan, kesayeteke girîng e."

**LI DIJÎ ZILMÊ BERXWEDAN**

Ozturk, di dewama axaftina xwe de got: "Bi kûrkirina tecrîdê, dixwazin peyama "Em ê we tune bikin, em ê we di jenosîdê re derbas bikin" bidin gelê kurd û gelan. Dîroka me dîroka berxwedanê ye. Kurdan hemû destkeftiyên xwe bi berxwedanê bi dest xistine. Ger dîrokeke wan a zilmê hebe, a me jî dîroka me ya berxwedanê heye."
Ozturk, da zanîn ku tecrîd li dijî hiqûqa navneteweyî ye û got: "Çi dibe bila bibe, bi tu awayî tecrîd nayê qebûl kirin. Birêz Ocalan çi dema biaxive, dengê wî yê ji bo aştî, demokrasî û azadiyê bilind û belav dibe. Bi vê re rewşa heyî diguhere. Di pêvajoyek wiha de rêbereke ku divê dengê wî bilind bibe Birêz Ocalan e. Lê ji bo ku civak vî dengî nebihîse, tecrîdê girantir dikin."

**DAXWAZÊN GUVEN DAXWAZÊN ME NE**

Ozturk, behsa girîngiya çalakiya greva birçîbûnê ya Leyla Guvenê kir û got: "Pêkanînên hovane yên Esat Oktay bi berxwedanê têk çûn. Ji bo pêvajoya şer bi dawî bibe Birêz Leyla dest bi çalakiya greva birçîbûnê kir. Daxwazên Guvenê daxwzên me ne jî. Ji bo em ji vê tarîtiyê derbikevin, dê tecrîda li ser Birêz Ocalan bê rakirin. Hemû gelên Tirkiyeyê ji bo rakirina tecrîdê divê têbikoşin û xwedî li çalakiyên greva birçîbûnê derbikevin."

**YEKITIYA GELÊ KURD GIRÎNG E**

Herî dawî Berdan Ozturk bal kişand ser girîngiya yekitiya gelê kurd û got: "Kurd ji bo pêşeroja xwe divê biryaran bidin û bên gel hev. Ger yekitiya me tune be û em di rewşek parçekirî de bin, wê demê em ê nikaribin bi ser bikevin. Îro li Herêma Kurdistana Federe buroyên Tevgera Azadî hatin girtin. Ev girtin li dijî yekîtiya neteweyî ne. Ev rewş rê li ber bêhêviyan vedike. Gelo rayedarên Herêma Federe wê bi van girtinan çi bi dest bixin? Li Tirkiyê jî partiyên me hatin girtin. Gelo karin tiştekî bi dest bixin? Na. Ev rewş rê li ber bêhêvîtiyê vedike. Divê dest ji van pêkanînên şaş berdin."…*MA*



### Şerxwazî û Aştîxwazî

Tayîp TEMEL

Bi girtina Sirri Sureya Onder û cezakirina Demîrtaş û Baluken peyamek girîng ji hêla dewletê ve hat dayîn. Wan peyama; 'Qet hêviya çareseriyê û muzekereyan nekin' da û qasidên aştiyê jî avêtin zîndanê
Gelê kurd bi sed salan e ku di şert û mercên şer de dijîn. Bi taybetî jî di 35 salên dawî de kurdan şahîdî ji şerekê nedîtî yê ku mînakên wî li dinyayê kêm tên dîtin kirin. Neyar kurdan qetlîam û jenosîdên hovane li ser wan meşandin. Ji ber vê yekê jî di lûxata kurdan de peyvên wekî 'ŞER', 'QETLÎAM', 'QIRKIRIN' cihekê girîng digire.
Dibe ku ji ber dijwariya şer û cenga giran be di ferhenga kurdan de cihê peyvên 'AŞTÎ' û 'ÇARESERÎ' gelek mezin e. Kurd ji heft salî heta 70 salî dema devê xwe vedikin dibêjin; 'Em aştiyê dixwazin'... Di şert û mercên dijwar ên şer de jî û di nava aramiyê de jî daxwaz û doza wan her û her 'AŞTÎ' ye.
Li gorî gelek zanyarên civakî û siyasî 'AŞTÎ' tenê nayê wateya 'rewşa bêşer û aram', her wiha tê wateya nêrîna li jiyanê û pejirandina xwezaya civak û gerdûnê. Heke hêzek an jî kesek xwedî feraset û zîhniyeta serdest û hikûmdariya li ser civak, xweza û derdorê be ne mimkûn e ku mirov li wir behsa 'rewşhala aştiyê' bike.
Îro li hemû cîhanê tu peyv bi qasî têgeha 'AŞTÎ' yê nehatiye pîrozkirin û li ser tu gotinên din ev qas stran, helbest û nivîs nehatine nivîsandin. Tevî ev qas eleqe û pîrozkirinê jî mirovahî hîn jî li hemû deverên cîhanê birçî û tîn in bo aştiyê.
Bêguman gelek sedemên vê yekê hene. Lê sedema esasî û girîngtir jî ew e ku her kes wateyeke cuda li gotina 'AŞTÎ' bar dike.
Li gorî hinek zanyar û civaknasan aştî encax piştî jiholêrakirina hest, hiş û rewşa şer bê sazkirin. Ango ew kes û derdor di wê baweriyê de ne ku AŞTÎ bi tunekirin û jiholêrakirina rewşa dijber dê bê fêmkirin û peydakirin.
Em bên ser mijara kurdan a aştiyê û hêviya çareseriyê...
Rewşeke pir aşkera heye. Li holê dewlet û hikûmeteke ku bi amûr û artêşeke mezin êrîşî kurdan dike heye. Rayedarên vê hikûmeta êrîşkar bi tu awayî behsa aştî û diyalogê nakin û her tim dibêjin 'em ê koka wan biqelînin'.
Li aliyê din jî Tevgera Kurd a di her şert û mercan de behsa girîngiya aştî, diyalog û muzakereyan dike heye.
Gelo di rewşa heyî de divê aştîxwaz û alîgirên çareseriyê bangî kîjan alî bikin? Divê dijberên şer li hemberî kîjan alî rawestin?
Bêguman divê helwest li hemberî aliyê ku şerxwaz bê nîşandan û heta divê ew derdor hemû li kêleka kurdên azadîxwaz û aştîxwaz cihê xwe bigirin.
Lê tiştek zelal heye ku aştîxwaz ji dewleta şerxwaz bêhêvî ne û heta ji ber zextan nikarin bi rehetî helwesta xwe li hemberî wan nîşan bidin. Vêca bi rehetî bang li kurdên di bin xetereya qetlîamê de ne dikin ku 'aştî û diyalogê' esas bigirin.
Êdî zelal e ku heta aştîxwaz û derdorên dijberiya şer dikin li hemberî êrîşên dewletê ranewestin û pêşî li wan negirin, nikarin behsa aştî û diyalogê ji bo aliyê kurd bikin.
Heta li gorî Peymana Medîneyê divê navbeynkar bang li her du aliyan bikin da ku aştiyê pêk bînin, lê kîjan alî qebûl neke divê li hemberî wî alî bikevin nav têkoşîneke çalak û aktîf.



# Divê CPT ji bo Ocalan bikeve dewrê

**Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan roj bi roj tê girankirin û berdewam dike. Fikarên di derbarê Rêber Ocalan de her diçe zêde dibin. Parêzerê Ocalan Îbrahîm Bîlmez nerazîbûn nîşanî tecrîdkirina Ocalan da û di serî de CPT bang li saziyên Ewropayê kir tavilê bikevin nava tevgerê.**



Parêzer Îbrahîm Bîlmez nerazîbûn nîşanî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan da û di serî de CPT bang li saziyên Ewropayê kir ku ji bo Îmraliyê tavilê bikevin nava tevgerê.
Parêzerê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Îbrahîm Bîlmez, bal kişand ser şert û mercên Girtîgeha Îmraliyê, helwesta CPT û biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) û dest nîşan kir ku Îmrali girava derhiqûqiyan ne û Tirkiye qanûnên xwe binpê dike.

**OCALAN POLÎTÎKAYEK ALTERNATÎF AFIRAND**

Bîlmez bi bîr xist, sîstema tecîda li Îmraliyê ji sala 1999'an û vir ve bi rêk û pêk didome û ev tecrîd tenê bandora xwe li Îmraliyê nake, bandora li tevahiya Rojhilata Navîn dike.
Bîlmez da zanîn, Tirkiye êdî dewleteke hiqûqî, qanûnî nîne û her ku diçe ji hiqûqê dûr dikeve.
Bîlmez diyar kir, tecrîdkirina birêz Ocalan bandorê li tevahiya gelên Kurdistanê û Tirkiyê dike û wiha axivî: "Armanca tecrîdê di çarçoveya planên siyasî de kûr dibe û mirov dikare vê tecrîdê bi pêvajoya komploya navneteweyî ve jî girê bide. Bê guman tecrîda girankirî dewama komploya navneteweyî ye û cudahiya wê ji hev tune ye. Armanca sereke ya komployê di şexsê Ocalan de tinekirina lêgerîna azadiyê ya gelan bû. Lê belê hêzên ku xwestin Ocalan ji holê rakin li hemberî raman û bîrdoziya birêz Ocalan têkçûn."

**DEWLET HER HEFTEYÊ BI FERMÎ DEREWAN DIKE**

Bîlmez anî ziman, ji ber ku birêz Ocalan ji bo gelan çareseriyek alternatîf afirand, hêzên komploger sîstema Îmraliyê ava kirin û wiha dewam kir, "Birêz Ocalan li dijî jiyana dewlet û neteweDewletê ya ji bo gel pêşniyar dike, çareserî û jiyanek alternatîf pêşniyar kir. Sîstema Îmraliyê hate avakirin û ev sîstem ji sala 1999'an û vir ve bi rêbazên cuda dewam dike. Heta niha dewletê bi awayek fermî derew dikir û digot, 'keştî xera bûye yan jî rewşa hewayê ne baş e'. Niha jî bi hinceta cezayê rêzkariyê mafê hevdîtinê hate qedexekirin. Ji roja ewil heta niha hiqûq li Îmraliyê nakeve dewrê. Mixabin li Tirkiyê dema mijar dibe Birêz Ocalan rewş diguhere."

**DMME JI RÊGEZÊN XWE DÛR KETIYE**

Bîlmez nerazîbûn nîşanî biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) jî da û wiha got: "Her çiqas ev sazî weke ku saziyên parastina mafên mirovan derketibin holê jî niha bûye saziyên parastina pergala kapîtalîst û hiqûqa vê pergalê temsîl dikin. Biryara DMME'yê siyasî ye û DMME bi vê biryarê ji rêgezên xwe yên avabûnê û mafên mirovan dûr dikeve. Ji xwe ti bendewariyeke birêz Ocalan jî ji van saziyan tineye."

**DIVÊ CPT BIKEVE DEWRÊ**

Bîlmez destnîşan kir, di vê serdemê de saziya tenê bikare biçe Îmraliyê Saziya Pêşîgirtina li Êşkenceyê (CPT) ye û got, "Di vê demê de rolek mezin dikeve li ser milê CPT. Li Tirkiyê bi awayekî derqanûnî hemû hevdîtinên malbat û parêzeran bi hincetên bêbingeh tên astengkirin. Li Îmaraliyê tecrîdek girankirî tê meşandin û hemû rêyên hiqûqê hatine girtin. Divê CPT biçe Îmraliyê û lêkolînan pêk bîne. Ti agahiya me ji miwekilê me tuneye ku li Îmraliyê ye. Ji ber ku ti agahiyên me birêz Ocalan û her sê miwekîlên me yên din nîne em ji rewşê bi fikarin. Divê CPT û hem jî saziyên din yên welatên Ewropayê têkevin dewrê."
Bîlmez da xuyakirin ku tecrîdkirina Ocalan rabe wê Rojhilata Navîn jî bêhnek bistîne û bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Birêz Ocalan aktorekî bi bandor e û Rêberekî aştîxwaz e. Tirkiye bi xwe jî dibêje muxatabê sereke yê pirsgirêka Kurd birêz Ocalan e."…*ANF*


## Çareseriya aloziya Sûriyê bi danûstandinê ye



MSD'ê diyar kir ku ew danûstandinê weke rêbaza sereke ya çareseriya şer û aloziya Sûriyê dibînin.
Meclîsa Sûriya Demokratîk MSD ket sala xwe ya sêyemîn. Bi munasebeta 3. salvgera damezrandinê MSD'ê daxuyaniyek da. MSD'ê diyar kir ku xebat û têkoşîna wan ya ji bo çareseriya aloziya Sûriyê dewam dike û wiha got, "Ji bo pêkanîna projeya Netewa Demokratîk û biratiya gelan û her wiha ji bo rizgarkirina Efrînê ji dagirkeriyê emê asta têkoşîna xwe bilindtir bikin.
Di daxuyaniya MSD'ê de wiha tê gotin:
"Em ji bo parastina yekîtiya Sûriyê xebatên xwe di asteke bilindtir de dewam dikin. Di encama tekoşîna siyasî ya MSD'ê û têkoşîna QSD'ê ya li dijî DAIŞ'ê de rûpîvaneke mezin ji axa Sûriyê ji dagirkeriya DAIŞ'ê hat rizgarkirin. Ev berxwedan îro li Hecînê dewam dike. Li rex şerê rizgarkirinê meclisên sivîl û xizmetguzariyê hatin avakirin da ku ewlehî û aramî li van herêmên rizgarkirî pêk were.
Herî dawî Rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê li gorî sîstema nenavendî ya demokratîk ji bo paşeroja Sûriyê hat damezrandin. MSD'ê ji bo pêkanîna hevgirtina opozîsyoneke demokratîk û laîk hevdîtinên Sûrî-Sûrî li bajarê Eyn Îsa li dar xistin. Em hewl didin van hevdîtinên xwe berdewam bikin da ku kongreya niştîmanî ya giştî Sûriyê were lidarxistin. MSD rêbaza diyalogê ji bo çareserkirina hemû dozên Sûriyê ji xwe re esas digire.
Heta niha û di van 3 salên borî de MSD'ê di qada siyasî de roleke girîng lîst. Bi vê boneyê em damezirandina MSD'ê careke din li hemû welatiyên Sûriyê, partî, sazî û aliyên serbixwe yên di bin sîwana MSD'ê de pîroz dikin. Em ê xebatên xwe ji bo avakirina neteweya demokratîk û pêkanîna biratiya gelan di asta herî jor de bidomînin."




Serokê artêşê yê hevbeş Joseph Dunford diyar kir ku QSD ku ji hemû pêkhateyên Sûriyê pêk tê, rêxistina terorîst li Rojhilata Navîn DAIŞ'ê têk bir. Dunford da zanîn ku rêya wan li Sûriyê hê jî dirêj e û ji ber wê nikare dema mayîna hêzên xwe di Sûriyê de diyar bike.
Serokê Artêşê yê Hevbeş yê DYE'yê Joseph Dunford ji Rojnameya Washington Post re axivî û behsa hevkariya DYA ya li Sûriyê bi QSD'ê re kir. Dunford di derbarê mayîna hêzên Amerîkayê li Sûriyê wiha got: "Em li ser nefikirîne. Hevkarên me yên QSD'ê di Sûriyê de destkeftiyeke mezin li dijî DAIŞ'ê pêk anîn û ev yek tiştekî giranbuha ye. Lê der barê peydakirina aramiyê de hê jî rêya li pêşiya me dirêj e."
Dunford wiha dewam kir: "Divê 35 heta 40 hezar leşkerên hêzên herêmî bêne perwerdekirin da ku karibin aramiyê peyda bikin. Heta niha ji sedî 20 ji van hêzan hatine perwerdekirin. Em van hêzan perwerde dikin û hêza wan a şer xurt dikin, tevî ku di şer de leheng in em dixwazin hêza wan baştir be. Eşkere ye ev hêza şerker QSD ji hemû pêkhateyên Sûriyê hatiye avakirin û hêza tekane ye ku karibû rêxistina DAIŞ'ê ya terorîst li Rojhilata Navîn têk bişikîne."
Dunford got rewş li Sûriyê tê guhertin û niha ji 3 salên borî baştir e û hebûna wan niha di Sûriyê de dibe ku dirêj bibe û dibe ku li gorî rewşan were guhertin.



### Girîngiya Şaredariyên Bakur (1)

Burhan ERDEM

Berovajî cîhanê, li Tirkiyeyê giraniya rêveberiya navendî herku çû zêdetir bû. Heta ku şaredarî ketin destê partiyên koka xwe ji tevgera azadiya kurd werdigirtin. Di hilbijartinên 31ê Adara pêş de jî, bidestxistina van şaredariyan gelekî girîng e.
Dîrokzan dibêjin weke hemû împaratoriyan Rêveberiya Osmanî jî ji demokrasiya herêmî re biyanî bû, ji xwe mefûma demokrasiyê li cem wan nedihate nasîn. Heta sedsala 19 an rêveberiya klasîk a Osmanî ji bo li herdeverê gel tevlî rêveberiyê bibe tu karek nekiriye, çêkirina rêveberiyên herêmî jî nehatiye bîra kesekî.
Pispor sedemên vê yekê wisa rêz dikin:
-Awayê hûnandina civakî bêtir li ser çandiniyê bû, awayekî girtî, hiyererşîk, civakeke bê teşebûs û bêyî rexne bû.
-Civakek ku hemû xizmeta mahalî dewrî waqif, tekke û zaviyeyan kiribû.
-Famaneke civakê hebû ku, hemû xizmet ji dewletê dipa.
Di sala 1840î de tanzîmat kete jiyanê û bi tanzîmatê re sîstema meclîsên herêmî hate. Lê ev sîstem jî bi kêrî civakê nedihat, ku li van meclîsan temsîla gel gelekî kêm bû û heta nûnerên çîna navîn jî nikarîbûn di van meclîsan de cîh bigrin. Nûnerên vê meclîsê ji ulema, axa, eşraf û kesên xwediyê erda pir pêk dihat û rêveberî jî bi destên van kesan dimeşiya. Lê bi vê yekê re li dewleta osmanî êdî rêveberiya herêmî pêk hatibû. Meclîsên Muhasîsî, li dû wan meclîsên memleket, pişt re wîlayet, lîva, qeza pêk hatibûn. Meclîsên îdareyê hebûn, li komîsyona zîraatê, sadoxa milk û li meclîsa belediyeyê nûnerên gel peyda dibûn. Piştî şerê Kirimê li Stenbolê rêxistina Şehremanetî hatibû sazkirin.
Di sala 1858 an de li Stenbolê pêşiyê belediyeya Beyoxlû û Galatayê hate sazkirin, pişt re heta sala 1869 an li hemû Stenbolê belediyeyê dest bikar kiribû. Navê vê rêxistinê jî Şehremanetiya Stenbolê bû.
Li Tirkiyeyê pêşketina rêveberiyên herêmî bi destûra bingehîn a sala 1921ê pêk hat. Li gorî xalên 11 û 14 yên vê destûrê dihate gotin ku, wîlayet ji bo karên mahalî xwediyê şaxsiyeteke otonom û manevî ne.Bi hilbijartina gel şûrayên wîlayeta pêk dihatin ku vana ji perwerdeyê heta tendrustiyê, ji çandiniyê heta avahiyan ji gelek karan berpirsiyar bûn. Bi vê yekê re statuyeke girîng ji rêveberiyên herêmî re dihate dayin ku heta niha li dîroka rêveberiya vê herêmê nehatibû dîtin.
Pişt re di sala 1930yî de qanûna belediyeyê hatibû derxistin û bi vê qanûnê re ji bo belediyeyan erkeke mezin hatibû dayin ku ev gaveke geleke girîng a dîroka belediyeyan bû. Di van salan de hêza rêveberiya malî ya belediyeyan gelekî hatibû bilindkirin, lê di nava salan de ev hêza maddî herku çû kêmtir bû. Ji ber vê yekê jî li Tirkiyeyê rêveberiyên herêmî her bi paş ve ketin.
Niha li Tirkiyeyê belediye, îdareya taybet a bajaran û gund weke sê saziyên rêveberiyên herêmî di jiyana mirovan de cîhê xwe digrin. Tevî vana, belediyeya bajarê mezin jî di salên dawîn de weke modeleke nû ketiya jiyana mirovan. Gund û belediye ji bilî rêveberiyên herêmî weke îdareyên civakê jî tên nirxandin. Cihêtiya di navbera van îdareyan de tenê li gorî nufûsa wan tê kirin û vana xwediyê îdareyeke mahalî ne.